Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî




DI VÊ HEJMARÊ DE:

Daxuyaniya Pdki bi hilkefta 81 saliya damezrandina wê...................... 2
Rojev ...................................... 7
Hevpeyvîn ................................ 8
Mafê Mirov .............................. 11
Poster...................................... 12

Hejmar (523)
2026-08-06

www.agirimedia.org

# Gelawêj stêrka vejînê




25ê Gelawêjê di dîroka tevgera rizgarîxwaz a gelê Kurd de rojeke pîroz û werçerxaneke mezin e. Bi avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ), têkoşîna Rojhilatê Kurdistanê derbasî qonaxeke nû, organîze û hemdem bû. Piştî 81 salan ji xebat û berxwedanê, PDKÎ ne tenê mîrata mezin û neteweyî a Pêşewa Qazî Mihemmed diparêze, di heman demê de xwedî berpirsiyariyeke mezin e ku xwe wekî partiyeke neteweyî û modern nûjen bike.

Îro erkê PDKÎ yê sereke di çar aliyên bingehîn de xwe nîşan dide:

Siyasî û Neteweyî: Divê PDKÎ bibe sitûna yekrêzî û hevgirtina tevahiya aliyên Rojhilatê Kurdistanê. Erka wê ye ku daxwazên dêmokratîk û mafê çareseriya pirsa neteweyî berfireh bike û baweriyê bide civakê ku ew alternatîfeke xurt û dêmokratîk e aliyê kêm li Kurdistanê de.

Dîplomasî: Di asta navdewletî û herêmî de, avakirina peywendiyên xurt û zelal hewceye. Divê dengê mafxwazî ê gelê Kurd bigihîne navendên biryardanê yên cîhanê û piştgiriya siyasî û mafên mirovan bo dozê peyda bike.

Çekdarî û Ewlehî (Hêza Pêşmerge): Hêza Pêşmerge mîrata pîroz a vê Hizbê ye. Îro erka wê ew e ku ji aliyê dîsîplîn, perwerde û stratejiyê ve modern bibe, da ku bibe mertalê parastina gel û hêzekî xurt ku li dema guherînên mezin de bikare parêzvaniyê ji Kurd û Kurdistanê bike.

Têkoşîna Medenî û Xebata Civakî: Piştgirîkirina şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî", xurtkirina xebata sivîl di nav bajêr û zankoyan de, û bikaranîna medyaya nûjen ji bo bilindkirina hişyariya neteweyî girîng e, PDKÎ dive di vê qonaxa hestiyar de gelek giringiyê bide çalakiyên medenî di nava parên cuda yên civatgeha Kurdistanê û dive piştîvan û handerê wan be, ku bêguman ev piştevanî dibe sedemê yekîtî û yêkdengiya gel.

Piştî 81 salan, 25ê Gelawêjê ku bîranîna jidayîkbûna Hizbekî pêşeng e, lê di heman demê de bangawaziyek e bo paşerojê. PDKÎ bi hevgirtina qada medenî, diplomaî, leşkerî û siyasî dikare bibe hêvî û garantiya rizgariya Rojhilatê Kurdistanê.

Ev sitêrka geş anku Gelawêja Kurdan, maka rêbazê bo Kurdayetiyê afirandiye û hertim dê wisa geş bimîne. Pîroz be ev hilkeft û jidayîkbûn û hildana stêrka vejînê û geşe esmanê Kurdan, anku salvegera avabûna Hizba Dêmokrat

## Kolberî, Berdewamiya Fetwa û fermana 1358an û Jiyana di bin dagirkeriyê de



Sînor di hemû cîhanê de cihê bazirganî û aramiya xelkê ne, lê li Kurdistanê sînor bûye qada şerekî yekalî û wêranker. Ciwan, xwendekarên zanîngehê, bavên kal û zarok jî ji bo pariyek nanê kêm neçar in barên giran bi kîlometreyan di rêyên dijwar bipêçin...

RUPELA 9

## Drenge û zûya wê heye, lê ne şewitandin û ne jî şewitîna wê heye



Komara Îslamî piştî şoreşa 1357an a Rojî zêdetirî çar dehsalan ji Rojava ber bi Rojhilat ve çûye. Bi gotineke din, rejîma ku Îranê birêve dibe di çend dehsalên borî de welat veguherandiye bindestê Çîn û Rûsyayê, û di vê demê de ....

RUPELA 5

## Tiştên ku divê Kurdistan ji jenosîda sala 2014an li Şingalê fêr bibe



Pêdiviya Kurdistanê bi yekrengiya siyasî nîne; pêdiviya Kurdistanê bi yekîtiya stratejîk heye.Divê partiyên Kurd bikaribin bi hev re tevbigerin, tevî cudahiyên xwe yên derbarê mijarên sereke yên neteweyî de. Divê ewlekarî, parastina kêmneteweyan, perwerde ...

RUPELA 10

# Daxuyaniya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 81 saliya damezrandina wê

## Xelkê Kurdistanê ê mafxwaz û xebatkar!

## Endam û alîgirên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê!

25ê Gelawêja îsal 81 saliya damezrandina Hizba Dêmokrat a Kurdistanê ye. Wî serdemê û piştî zêdetir ji du dehkan zext û zordariya hikûmeta Reza Şah bi armanca helandin û jinavbirina nasnameya neteweyî ya Kurd bi rêya sepandina ziman, çand û îradeya siyasî ya serdest, partiyek ji dayik bû ku bû alahilgirê qonaxeke nû di têkoşîna neteweyî ya Kurd de li Rojhilatê Kurdistanê. Di navbera wan du dehkan de û di dema ku ji Bakur heta Başûrê Rojhilatê Kurdistanê -ji Simko yê Şikak bigire heta şoreşa Rêno li Îlamê- tevgera mafperwer a Kurd dijî rêjîma Pehlevî hebû, li navenda Kurdistanê jî ramana nasyonalîzma Kurdî di pêşketinê de bû. Ramaneke ku partiya "Âzadî" bingehê wê danî, "Komela Jiyanawa Kurd" wateya neteweyî da wê û di encamê de "Hizba Dêmokrat a Kurdistanê" bû berhema wê rabûna siyasî û girseyî bi ramana neteweperweriyê.

Damezrandina Hizba Dêmokrat a Kurdistanê li ser destê Pêşewa Qazî Mihemed encama hişyariya siyasî û neteweyî ya Kurd bû ji bo berxwedan û rawestana li dijî siyasetên asîmîlasyonê yên Pehlevî. Hizba Dêmokrat dixwest li gel pêlên nûbûna Îranê, civaka Kurdistanê jî nû bibe û daxwazên xwe yên rewa û mafperwer bi rêya partiyeke sivîl û modern mîna cîhana nû bike rojev. Di rastiyê de Hizba Dêmokrat a Kurdistanê mînakên yekem ên guhartina bingehîn di pêkhatina civakî ya Rojhilatê Kurdistanê de bû, lewma wê Hizbê karî di heyama kêmtir ji salekê de bingeha hikûmetê deyne. Komara Kurdistanê bi wan hemû destkeftên dîrokî, neteweyî û siyasî ku berhema wê guhartinê di civaka Kurdî de bûn, ew şêwazê nû yê têkoşîna modern bû ku Kurdan cara yekem di dîroka xwe de bi rêya partiyeke siyasî û bi plan û bernameyeke armancdar dimeşand.

Hizba Dêmokrat ne tenê Kurd kire xwedî hikûmet, belkî wate û gotara siyasî da têkoşîna mafperwer a neteweya xwe. Gotarek ku her çend bi berdewamî li gorî hewcehî û guhartinên siyasî hatiye guhartin, lê cewherê wê yê neguhêr bûye stûna jiyana siyasî ya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê. Bi awayekî ku heta niha jî Kurd siyasîtirîn netewe ye di nav pêkhateya erdnîgariya Îranê de û wê taybetmendiyê wisa kiriye ku ji bo demekê jî tevgera rizgariya wî gelî neskine.

Têkçûna Komarê û darvekirina Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî, tevî ku derbeyeke giran bû li Hizba Dêmokrat, lê di heman demê de ezmûneke girîng bû hem ji bo Hizba Dêmokrat û hem jî ji bo tevgera rizgariya gelê Kurd. Berdewamiya Hizba Dêmokrat di rêya têkoşînê û vejandin û ji nû ve avakirina pêkhateya Hizbê û birêvebirina têkoşîneke bi xwîn lê tijî destkeft, ev Hizb ew qas qal kir ku heke rojekê rêberên mezin ên wekî Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkindî jî ji dest bide, dîsa li ser pêyan bimîne û îradeya wê ya neteweyî neşkê.



Berdewamiya Hizbê piştî Komarê û xwendina rêberên nû ji bûyerên Îranê re di destpêka salên 30î yên rojî de û hewldana ji bo tevlîbûna di proseya siyasî ya Îranê de dikare wekî nîşaneyên qonaxeke nû ya gotarî di siyasetên wê Hizbê de bê nîşandan. Li ser wê bingehê, têkoşîna çekdarî ya salên 46-47an bersivdana siyasetên Mihemed Reza Şah beramberî pirsa Kurd piştî kudetayê bû, ku bi şehîdbûna alîgirên wê ramanê di Hizbê de, Hizba Dêmokrat zêdetir vegerya ser xwe û bername û siyasetên xwe, û ji Hizbeke bi qewareya modern bû Hizbeke modern bi hemû wateyê di warê ramanî, teorî û pratîkî de. Lewma dema ku şoreşa gelên Îranê di sala 1979an Zayînî de serket, Hizba Dêmokrat bû Hizbeke hezkirî û alahelgira gotara civakê û wekî tevgera siyasî ya herî girseyî di nav Îranê de rolek berçav di siyasetên Kurd û parastina mafên rewa yên wê neteweyê de lîst. Rastbîniya siyasî di heman demê de li gel tekezkirina li ser daxwaziyên neteweyî wekî taybetmendiya herî diyarkirî ya Hizba Dêmokrat di wê qonaxê de derket holê ku heta niha jî nexşe rêya wê Hizbê bûye di demên dijwar ên jiyana neteweya Kurd de.

Tevlîbûna di şoreşa gelên Îranê de, destpêkirina danûstandinan bi hikûmeta nû re, avakirina hevpeymaniyê bi aliyên Kurdî re, têkçûna danûstandinan û şer û berxwedana çekdarî ya salên dehkên 60 û 70yî, şehîdkirina rêberên mezin ên Hizbê Qasimlo û Şerefkindî, ezmûngirtin ji veqetînên nav Hizbê de, guhartina dirûşma sereke ji xudmoxtariyê bo fêderalîzmê, mûşekbarana baregehan, avakirina Navenda Hevkariyê û paşê Navenda Diyalogê û niha jî Hevpeymaniya Kurdistanî û guhartinên di gotara siyasî ya wê Hizbê de li gorî mercan, giringîdan bi rêya têkoşîna sivîl li hundir, Newrozên bi girse yên Kurdistanê û sembolên Kurdî wekî nirxekî neteweyî, ev hemû ezmûnên girîng in ku Hizba Dêmokrat kirine ew Hizba astbilind ku tevî hemû astengiyan karî ye hezkirî di dilê nifş li pey nifşên Rojhilatê Kurdistanê de bimîne.

Ji aliyekî din ve, tevlîbûna di hevpeymaniyên giştî yên wekî Kongreya Neteweyên Îrana Fêderal, "Navenda Hembestegî ji bo Azadî û Wekheviyê" û gelek civak û saziyên din ên giştî di qada siyasî ya Îranê de, meşîna li ser rêya Qasimloyê mezin û tekezkirina li ser rastbîniya siyasî ye di siyasetên Kurdî de, ew jî di dema ku Hizba Dêmokrat wekî berpirsiyartirîn partiya Kurdî hemû demê li ser bingehên neteweyî tekez kiriye û qet neviya ye hivya Kurdayetiyê ya neteweya Kurd di wê parçeya Kurdistanê de sar bibe.

## Xelkê nîştimanperwer û azadîxwaz ê Kurd!

Hizba Dêmokrat tevî ku di dirêjahiya 81 salên têkoşînê de li ser xeta neteweyî û nirxên nîştimanî maye, berdewam wekî partiyeke pêşkeftinxwaz viya ye adetên xerab ên civakê jî biguhêre û fikir ji welatekî modern û serdemane bi berçavgirtina wan nirx û bihayên ku destkeftên hêja yên mirovahiyê ne, ji bo civakeke azad, dadperwer û saxlem kiriye.

Hizba Dêmokrat tekez kiriye ku serweriya siyasî bêyî sepandin û pejirandina mafê jinê wekî pirsek serbixwe nayê destxistin. Di ramana Hizba Dêmokrat de divê mêrsalarî di mejiyê mirovê Kurd de cî ji bo baweriya bi şanaziya jinê û rakirina hemû zilmên li ser jinan vala bike û ji nêrîneke mirovane li babet û pirsên neteweyî û civakî bê nêrîn, ne ji nêrîneke teng a zilamane. Baweriya bi rola hemû pêkhate û herêmên cuda yên Rojhilatê Kurdistanê di têkoşîna nîştimanî û avakirina Kurdistaneke modêrn di paşeroja azadiyê de baweriyeke neguhêr û bingehîn bûye û dê bimîne. Kar û karnameya wê Hizbê di dirêjahiya heşt dehik têkoşînê de nîşan daye ku Hizba me bi bidestxistina gelek destkeftên siyasî, neteweyî û dîrokî bi bihayê gorîkirina canê zêdetir ji pênc hezar şehîdên sengerê, nêrînên siyasî di qada têkoşîna Rojhilatê Kurdistanê de heta niha jî civaka Kurdistanê baweriya sereke li wê Hizbê heye û bi wê piştgirî û baweriyê dê di têkoşîna xwe de berdewam be.

Niha jî di rewşekê de ku Îran ketiye qonaxeke cuda û Komara Îslamî rêberê xwe yê berê ji dest daye û rêberê wê yê nû ji navekî zêdetir tiştek nîne, û di dema ku desthilat di navenda şerekî nediyar ê derve û şerê aliyên hundir de ye ji bo qorixkirina desthilatê, tevgera mafperwer a gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê tevî hemû givaş û zordariyên dezgeha tepeserkar heta niha li ser pêyan e. Di heman demê de, berhema hewldana 81 salan a Hizba Dêmokrat ji bo bihêzkirina civaka sivîl a Kurdî û bihadana bi rola girseyê di pêşvebirina têkoşîna nîştimanî de serkeftî bûye.

Îro di 81 saliya temenê Hizba Dêmokrat de, têkoşîna piralî ya Hizba me ji her demê zêdetir wate girtiye. Hewldanên dîplomatîk ên Hizbê li gel aliyên cîhanî ji bo nasandina pirsa Kurd û li gel opozîsyona Îranî ji bo misogerkirina mafê serweriya siyasî, têkoşîna sivîl û têkoşîna medyayî bi rêya wê xwîna nû û ciwanên ku vegeriyane nav damarên wê de, herwisa têkoşîna pêşmergane bi hebûna hêza pêşmerge wekî mile biqawet ê gel, rengvedana stratejiya têkoşîna piralî ya Hizba Dêmokrat a Îranê ne.

Hizba Dêmokrat di vê dema taybet de bi baweriya kûr bi rêbaza tijî şanazî ya rêberên şehîd û hemû şehîdên sorxelat ên neteweya me, peymanê nû dike ku ji rêbaza xwe ya nîştimanî dernekeve û tu êrîş û mûşek û dronbaran û heta leşkerî jî gavên wê sist neke û bi bawerî bi xwe di hewldana ji bo gihîştina bi armanca neteweyî de berdewam bibe. Herwisa bîranîna şehîdan û girtiyên siyasî bilind radigre û berxwedana malbat û kesûkarên wan nirxdar dibîne, û di wê pêxemê de bi ezmûngirtina ji dîrokê re bê rawestiyan cehdê dike ji bo parastina yekrêziya nav refên xwe û yekitiya neteweyî û peywendiya saziyî li gel hêzên siyasî yên din li Rojhilatê Kurdistanê.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Desteya Kargêrî**

**Gelawêja 1405 an a Rojî**

# 81 saliya xebat û berdewamiyê: Hizba Dêmokrat û erkên dîrokî yên nifşa nû li Rojhilatê Kurdistanê



N. Şemal Terxîbî

**Pêşekî:**
**Karvanek li ser rêya dîrokê**

81 sal li ser damazrandina Hizba Dêmokrat li bajarê Mehabadê û li ser destê Pêşewa Qazî Mihemmed û hevalên wî re derbas dibin. Ev rêxistina siyasî tenê partiyeke teqlîdî an rêxistineke siyasiya asayî nîne li dîroka hevçerx a kurdî de, belkî destpêka qonaxeke nû ya civakî, çandî û siyasiye ku pirsa kurdî ji serhildanên eşîretî û herêmî veguhast bo çarçoveya "damazraweyîbûn", "hikûmetmendî" û "diyarkirina pirsa bidestvegirtina qedera netewî".

81 sal xebata dijwar, pêşkêşkirina hezaran şehîdan ji rêberan, kadroyên fidakar, pêşmergeyên xweşmêr û endamên mafxwaz, Hizba Dêmokrat kiriye tevgera rizgarîxwaz û xoşvan li Rojhilatê Kurdistanê.

Îro ku em yadê 81 saliya xebata vê Hizbê de ne, cîhan û herêm bi destê pêleke kûr a guhartinên jêopolîtîkî, teknolojî û civakî re derbas dibe. Civaka Rojhilatê Kurdistanê li nav dilê desthilateke tepeserkar û dîktatorî wek Komara Îslamî de, rûbiřûyî kirîza aborî, siyasî û ewlehiyê bûye. Li vir e ku pirseke bingehîn bo nifşê nû (nifşê dîjîtal û ciwanên nifşê "Z" û şerê bo azadiyê) tê holê: Erka dîrokî ya vê nifşê li beramber mîrata 81 saliya Hizba Dêmokrat û paşeroja Rojhilatê Kurdistanê çi ye? Bo bersivdana rast bi vê pirsa cewherî, di çend beşan de em vê babetê şîrove dikin:

**Beşa Yekem:**
**Wêstgehên diyar yên 81 sal xebat û danîna momkên pişta nasnameya neteweyî**

Bo têgihîştin ji erkên nifşê niha, divê em di destpêkê de ji wê mîrata ku niha di ber dest de ye têbigehin. Hizba Dêmokrat li 25ê Gelawêjê 1324an de hat damazrandin û tenê piştî çend mehan yekem Komara Kurdistanê û hikûmetekî dêmokratîk li Mehabadê anî holê. Çêkirina sembolên wek Ala û sirûda neteweyî, xwendin bi zimanê kurdî û anîna jinan bo nav qada giştî ya civakî û siyasetê, ji berhemên zêrîn yên wî serdemî bûn ku heta îro jî gelê me şanaziyê pê dike.

Piştî nemana Komarê û darvekirina Pêşewa Qazî, Hizba wî ne tenê ji nav neçû, belkî bû pişta xebata siyasî û çekdarî li dijderketina rêjîma paşayetiyê (Pehlevî) û paşê dijderketina rêjîma totalîter a Îranê berdewamî da.

Li serdemê rêberên wek Şehîd Dr. Qasimlo û Şehîd Dr. Şerefkendî, Hizba Dêmokrat bû sembola dîplomasiya modern, hişmendiya siyasî û darêjtinga teoriya "dêmokrasî bo Îranê û xudmuxtarî bo Kurdistanê".

Li berdewamiya vê dîrokê de, Hizba Dêmokrat karî bi serbilindî ji nav bahoz û kirîzên mezin yên Şeřê Sar, bûyerên piştî şoreşa gelên Îranê li (1979), êrîşên asmanî û mûşekî, û terora rêberên xwe li Ewropayê derbas bibe. Ev mana dîrokî nîşana rehdaqutana vê rêbazê ye li nav dilê civaka Kurdistanê de; rêbazek bi armanca hewldan bo parastina nasnameya neteweyî û giringîdan bi nîştiman li beramber êrîşên yên din li derdora kurd û Kurdistanê.

**Beşa Duyem:**
**Hawekêşeya nû û guhartina şêwaza xebatê**

Cîhana îro cîhana hêza nerm, torên civakî, şerê zanyariyan û dîplomasiya dîjîtal e. Eger li sedsala borî de hawekêşeya xebatê bi şêweyekî serdemî li dengê çiyayan, radiyo, rêxistina nihênî ya nav bajaran û sengera pêşmerge de kurt dibû, îro sînorên xebatê berfirehtir bûne û bi Rasana Rojhilat xebata bajar û çiya li hev hatine girêdan û mil bi mil hev û bo yek armancê dixebitin.

Şoreş û bizavên civakî yên van salên dawiyê, bi taybetî tevgera "Jin, Jiyan, Azadî" û xwepêşandanên giştî yên Kurdistanê, diyar kirin ku civaka Rojhilatê Kurdistanê bûye civakeke zêde hişyar û pêşeng. Li vê rewşê de, nifşê nû û erkên wî nikare tenê wek paşko bo dîrokê werin dîtin, belkî wek karekterê serekî yê darêjtina paşerojê derdikevin.

**Beşa Sêyem:**
**Erkên bingehîn yên nifşê niha yê Rojhilatê Kurdistanê**

Li vê beşê de em dikarin erka nifşê nû di 5 beşên cuda de parve bikin ku bi vê şêwazê ye:

Parastina nasnameya neteweyî û xweragiriya çandî: Yek ji siyasetên metirsîdare hikûmeta navendî li Îranê, jinavbirina nasnameya çandî û neteweyî ya me û zimanê kurdî ye bi rêya asîmîlasyon û çêkirina rewşa nebaş li herêmên kurdî de. Erka serekî ya nifşê nû, parastin û bihêzkirina zimanê dayikê, dîroka hevbeş û nasnameya neteweyî ye. Ev jî bi rêya çêkirina naveroka çandî, wêjeyî, hunerî û fotografiya modern dabeş dibe ku bikaribe nifşê nû bi reh û kokên xwe ve girêbide.

Veguhastin ji "Hêza Req" bo "Hêza Nerm": Îro qada şer tenê sînor û çiya nîne; şaşeya mobaylan, medyayên cîhanî û platformên dîjîtal sengera nû ne. Nifşê nû divê şiyanên xwe li warên şerê zanyariyan, grafîk, vîdyodêkomênterî, medya dîjîtal û zanista înformatîkê de bi kar bîne da ku:




**A.** Dengê mafxwazî yê xelkê Rojhilatê Kurdistanê û amarên binpêkirina mafên mirovan bighîne saziyên nêvdewletî.
**B.** Senaryoçêkirin û propagandeya medyayên ewlehî yên rêjîmê hilweşîne.
**C.** Çîroka rastîn a xebata 81 saliya Partiya Dêmokrat bi zimanên pênasbûyî yên cîhanê berhem bîne.

Bihêzkirina rêxistina medenî û torçêkirin li navxwe de: Xebata serşeqamê û amadeyiya medenî bê rêxistina saxlem, zû rastî tepeserkirin û bêdengkirinê dibe. Erkê serekî yê ciwan û çalavanên nû li navxweyî Kurdistanê, rêxistina torên medenî yên edebî ye li forma civaka medenî, encumanên çandî, navendên zimanê kurdî, û grupên alîkariya aborî û civakî. Ev torane wek şahdemara bergiriya medenî kar dikin û di dema qeyran û şoreşan de riya tevgerê diparêzin.

Çêkirina pirekê di navbera "Nifşê Ezmûn" û "Nifşê Dîjîtal": Nifşê nû navê rastî çemkê "nedîtina derbasbûyê" an redkirina ezmûna rêber û kadroyên kevn bibe. Erkê exlaqî û siyasiyê, sûdwergirtinê ji ezmûn, bûyerên dîrokî û dersên 81 saliya Hizba Dêmokrat. Li heman demê de, divê ev ezmûne têkelî xewn û xeyalên nû yên avakirina nîştiman, teknolojî û zanista rêvebirina hevçerx bikin. Ev diyaloga nav-nifşî rê li dubarebûna şaşiyên dîrokî digire.

Xebat bo dadperweriya civakî û wekheviya zayendî: Komara Kurdistanê di serdemê xwe de destpêşxêr bû di anîna jinan bo nav qada siyasetê de. Îro, Hizba Dêmokrat û nifşê nû divê bi kiryarî parêzerê diruşma "Jin, Jiyan, Azadî" bin. Dadperweriya civakî, afirandina derfetan bo jin û ciwanan, û têkdana bingehên baviksalarî yên kevn li nav biryarên siyasetê û civakî de, cewherê pêşkeftî yê rêbaza Dêmokrat diyar dike.

**Beşa Çarim:**
**Zehmetî û astengiyên beramberî nifşê nû**

Nifşê niha yê Rojhilatê Kurdistanê li nav rewşa aloz de biryarê dide. Ji aliyekî ve guşara tund a ewlehiyê, gefa girtinê, îşkence û darvekirinê ji aliyê rêjîmê ve heye; ji aliyê din ve, şerê derûnî û hewldan bo çêkirina bêhîvitiyê, belavbûn di navbera hêzên siyasî de û haydana rasterast û nerasterast a ciwanan ji aliyê dijminên Kurdistanê ve bo koçkirin û destberdan ji xebatê, ji wan astengiyên mezin in.

Derbasbûna ji van astengiyan tenê bi îradeya qahîm, hişyariya siyasî, parastina yekîtiya neteweyî di navbera hemû parçeyan û hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê de, û hîvîdan bi paşerojê pêk tê. Nifşê nû divê têbigehe ku sernixûniya zordariyê berhemê xebata bêrawesta e, ne ku çavrerêkirina şans an benda egera bûyeran bin.

**Encam:**
**Pêşeroja geş û emegdariya bi armancan re**

81 saliya damazrandina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, tenê dîrokeke asayî li salnameyê de nîne, belkî rawestiyanek e bo vegeryan, nûbûn û peymannûkirinê. Vê Hizbê di dirêjahiya dîroka xwe de îsbat kiriye ku reha wê di nav îradeya xelkê de hatiye çandin û bi ti reşebayekî nakeve û nawestê.

Îro, Ala xebata azadîxwaziyê ku ji Mihabadê ve hat hildan û bi xwîna şehîd û rêberan hat avdan, di destê nifşê nû de ye. Nifşê dîjîtal û ciwanên hişyar yên Rojhilatê Kurdistanê, bi çeka zanist, têknolojî, îradeya neteweyî û bawermendbûn bi dêmokrasiyê, dikarin xebata 81 saliyê bibin dawîqonaxa xwe ku: bidestvehatina mafê diyarkirina qederê, azadî û serbilindî bo hemû xelkê Rojhilatê Kurdistanê.

# Daxuyaniya Hevpeymaniya Hêzên Siyasî ên Kurdistana Îranê li ser Rojeva Siyasî ya Kurdistan, Îran û Herêmê

**Nirxandina rewşa meydanî û erkeyên hevpeymaniyê**

**Xelkê xebatkar ê Kurdistanê!**
**Raya giştî û azadîxwaz!**

Di demekê de ku rewşa siyasî û jeopolîtîk a herêmê û Îranê di guherîn û qonaxeke hestiyar û tijî alozî de ye, civîna Hevpeymaniya Hêzên Siyasî ên Kurdistana Îranê roja pêncşemê, 1ê Gelawêjê ya 1405an di hemberî (23yê Tîrmeha 2026an) di çarçoveya nirxandineke hemîaliyane ya rewşê de hate lidarxistin.

Ev civîn di demekê de pêk hat ku hevkêşeyên navneteweyî û yên hundirîn ên Îranê tûşî guherînên kûr bûne û Komara Îslamî ya Îranê wekî penageha dawî ji bo peçavtina şikestên xwe yên hundirîn, ji hemî carê zêdetir teror û êrîşên asmanî û zeminî berfireh kirine.

Têkçûn û bêencambûna zincîra danûstandinên di navbera rêjîma Îranê û Amerîkayê de, nîşaneya zelal a xitimîneke siyasî ye ku ev rêjîm xistiye qedeman. Sîstemek ku li hundir de tûşî herifîna baweriya giştî û kirîza aborî ya bêhempa bûye, û li derve jî nikare bi dîplomasiyê kirîza çareser bike. Koma pirskirêk û kirîzên aloz û berbelav ên rêjîmê wiha lê kiriye ku ji êrîşên xwe yên li ser hev ên li ser partiyên siyasî ên Rojhilatê Kurdistanê berdewam be, heta li gorî rewşa birîndarên me yên di êrîşan de, îhtimala bikaranîna «keresteyên şewatê yan fosfora spî» pir e ku bêguman ev yek ji bilî nîşandana bêçarebûn û zelûliya zêde ya rêjîmê li hember tevgera rizgarêxwaziya kurd û hêz û enerjiya veşartî ya gel û partiyên wan, tawana dijî mirovahiyê ye jî.

Şermezarkirina tund a bikaranîna çekên qedexekirî, êrîşên muşekî, dronî û zeminî yên Komara Îslamî ya Îranê bo ser Herêma Kurdistanê û baregehên partiyên siyasî ên Rojhilatê Kurdistanê, tenê hişyariyeke mirovî nîne, belkî xwendineke siyasî ye jî ji bo ziyanên mezin ên vê tevgerê û şermezarkirina tawaneke mezin a şer e. Di vê êrîşa hovane de nirxên giran li ser tevgera me çêbûn. Hejmarek ji pêşmergeyên Partiya Azadiya Kurdistanê, komek ji pêşmergeyên Komelaya Şoreşger a Zahmatkêşên Kurdistanê, komek ji pêşmergeyên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û hejmarek ji gerîlayên Yekîneyên Rojhilatê Kurdistanê şehîd bûn û hewdem hejmareke zêde ji hêzên pêşmerge birîndar bûn. Bes hêj wekî hatî gotin ev pirpitînên dawî yên rêjîmekê ye ku di dedevê herifîn û mirinê de ye û nîşaneya bêhêvîtî û bêçarebûna rêjîmê ye li hember îradeya polatîn a neteweyekê ku di rêya bidestxistina mafên xwe yên rewa de dest ji xebatê bernade.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî ên Kurdistana Îranê ligel rêzgirtina di bîranîna van şehîdan de û serxweşî li malbat, heval û hevsengerên wan, van ziyanane wekî windahî ji bo tevahiya tevgera Kurdistanê dibîne. Hewdem hevpeymanî tekeziyê li ser wê yekê dike ku biryara yekrêzî û bihevrebûnê di nav tevgera Kurdistana Îranê de ne bijarde ye, belkî pêdiviyeke stratejîk e ji bo rûbirûbûna van êrîşan. Ji aliyê din ve parastina xwedîderketina li hêzan û bihêzkirina aramiya hundirîn a hevpeymaniyê derfetê dide ku di astê navneteweyî de hewldanên ji bo nasandina rewşa mirovî di Kurdistanê de û tawanên rêjîmê berferehtir bibin. Ji ber wê tekezkirin li ser çareserkirina pirsa rewa ya kurd di vê qonaxê de, bihêzkirina pira pewendiyên navneteweyî ye ji bo ku civaka cîhanî li hember van destdirêjiyan bêdeng nemîne û piştrast bike ku xebata rewa ya xelkê Kurdistanê ji bo bidestxistina mafên xwe yên bingehîn bi van rêbazên hovane natape.

Di dawiyê de jî, di civînê de biryar ji bo berdewamiya hindî zêdetir a karên meydanî yên hevpeymaniyê hate dan û hat ragihandin ku xebat û tekoşîna bihevre û hevalbendiya siyasî û meydanî ya partiyên siyasî yên di nava Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê, heta sernixûniya Komara Îslamî û bidestxistina mafên neteweyî û siyasiyên kurd li Rojhilatê Kurdistanê, dê berdewam be.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**

**1ê Gelawêjê ya 1405an (23yê Tîrmeha 2026an)**

# Dîrokek ji xebatê



**N. Aso Mênberî**

Her hizb û rêxistineke siyasi li gorî hewcedariya demê û mercên serdest bi ser civakê de û di çarçoveyeke taybet de ji dayik dibe, belê çarçove û pêkhateyeke serkevtî ew e ku bikaribe di hemû qonaxên xebat û têkoşîna xwe de xwe li gel bûyer û guhartinan nû bike.

Di 25ê Gelawêjê ya îsal de, 81 sal bi ser ji dayikbûna Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê re derbas dibin. Hizbek ku bi dirêjahiya hemû salên xebat û têkoşîna xwe, hevdem li gel ku cehd kiriye alahilgirê xebata neteweyî be û şerê nasname û şunasa neteweyî ya Kurd bike, hevdem li gel ku cih û warek e bo komkirina xelkê rizgarîxaz û handerek bo gernasiya tekan di pêxema kerameta, azadî û serbixweyiyê de be, pêgeheke bihêz bo komkirina hêza civakê û qutabxaneyek tijî ji zanist, mirovatî û emegdarî û fidakariyê bûye.

Gelek caran tê gotin, Hizba Dêmokrat hizbeke serdemiyane ye û ev yek li vir de wateya xwe digire ku ev hizb wekî avahiyeke siyasi ya modern û pêşkevtî, hewl daye li gel bûyeran, xwendina nû bîne holê, xesarnasiya bûyeran bike û bi xwe guncandin li gel rewşê, siyaseteke rastbînane peyrew bike.

Hevdem ev hizb qet ji paşeroj û nûbûnê venebûye. Li gel derbasbûna demê û guhartina serdemê, karitye nifşê nû tevlî xebata xwe bike û di komkirina hêza mirovî li dor bername û siyasets xwe de serkevtî be.

Hizba Dêmokrat xwedan dîrokeke dûr û dirêj ji xebat, qurbandan û giyanfidayiyê bo gihîştina bi azadiyê ye. Di pênava gihîştina bi vê azadiyê de jî, bi hezaran lorîkên xwe yên emegdar pêşkêşî baregeha azadiyê kiriye.

Ev hizb wek bitementirîn hizba siyasi li Rojhilatê Kurdistanê ku xwedan pêgeheke cemawerî ya bihêz e, yek ji giringtirîn taybetmendiyên wê pênasekirina xebatê bo rizgarî wek erkekî giştî ye. Hizba Dêmokrat berdewam hewl daye bi rêya rêkxistina xwe, hemû xelkê Kurdistanê di xebatê de beşdar bike û bo vê armancê jî bi danîna bername û siyaseta taybet a xwe daxwaz ji xelkê kiriye ku tevlî rêzên xebatê bibin.Li gel vê jî, bêyî cûdaî di pile û payeya teşkîlatî de, xebat û têkoşîna hemû kesekî bi nirx zaniye û hewl daye di dabeşkirina erkên xebatê de, hemû aliyan berçav bigire.

Dênek bi ser dîroka xebata vê hizbê de nîşanî me dide ku berî hemûyan, rêberatiya wê hizbê bûye ku di qonaxên cûda de, pêşengtiya xebatê girtiye ser milê xwe çiqasî bi nirxekî pir giran jî be.Mînaka diyar a vê nirxdanê, darvekirina Pêşewa Qazî bi destê rêjîma Pehlewî û piştre terora rêberên şehîd, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkindî bi destê dîplomat-terorîstên Komara Îslamî û piştre jî hejmareke din ji endamên rêberiya vê hizbê bi şêwazên cûda cûda bûye.

Ev yek nîşan dide ku di nava hizbê de, qurbandan bo rizgariya ax û neteweyê, ne girêdayî pêgeha teşkîlatî ye, belkî di her qonaxekê de û li gorî hewcedariya demê, takên nav vê hizbê, di pêxema armanceke hevpar



û giştî de amadeyî giyanfidayiyê ne, yek li ser maseya gotûbêjê û ewê din di berxwedana çekdarî li gel hêzên dagirkerên Kurdistanê de.

Hizba Dêmokrat bi dirêjahiya zêdetir ji 8 dekadan ji xebata xwe di qonaxên pir dijwar re derbas bûye, evraz û nişîvên pir zêde derbas kirine û bi sedan asteng hatine ser rêya wê. Belê ew tiştê ku ev hizb heta niha li ser pêyan hiştiye, tenê hêza xwedîbawer a pêşmerge ye, belkî xelkê Kurdistanê ne ku ev hizb wek mala xwe zanine û wek piştivanekî hemîşeyî di hemû qonaxan de alîkarî ya wê kirine.

Dr. Qasimloyê mezin keremkiriye: "Dîroka PDKÎ, dîroka çend rêveber û çend kadr û endaman nîne. Dîroka sed hezaran endam û hezaran şehîdan e. Di rastiyê de dîroka hemû xelkê Kurdistanê ye. Çunki Hizba Dêmokrat û xelkê Kurdistanê ji hevdu nayên veqetandin."

Her ev yek bûye sedem ku wek beşek ji felsefeya xebata vê hizbê, xelk wek beşekî neveqetiya ji xebata wê bê dîtin Hizb di hemû qonaxan de jî bi wî xelkî piştqahîm be.


Ev hizb felsefeya xebata xwe ne li ser bingeha şehîdbûnê, belkî li ser bingeha jiyan û berdewamiyê pênase kiriye. Takê ku tê çarçoveya Hizba Dêmokrat, bo wî ronî dibe ku armanca sereke, şere bo jiyanê! Ev şer, şerekî pîroz e çunki man, jiyan û paşerojê diafirîne, her ji ber vê xebat bo jiyan û paşerojeke geş dibe bingeheke fikrî.

PDKÎ piştî zêdetir ji heşt dehkan ji xebat û têkoşînê, ne tenê rêxistineke siyasi ye, belkî beşek e ji nasname, bîranîna girseyî û îradeya neteweyekê ye bo manê. Vê hizbê selimandiye ku bi piştgirêdana bi xelkê, bawermendbûn bi jiyanê û şiyanên xwe nûkirinê, dikare di beramberî hemû astengên dîrokê de li ser pêyan bimîne û wek meşxelek bo gihîştina bi azadî û dadperweriyê, rêya paşeroja nifşê nû ronî bike.

# Drenge û zûya wê heye, lê ne şewitandin û ne jî şewitîna wê heye



N. Kave Ahengerî
W. Hesen Mukerem




Rejîma Îranê piştî vajokirina têgihîştinnameyê di navbera xwe û Amerîkayê de, bi êrîşkirina li ser du gemiyên bazirganî têgiheştinname binpê kir û artêşa Amerîkayê bi dehan cih li nav axa Îranê bombebaran kir. Komara Îslamî berdewam kir bi tolhildanê û bi êrîşên li ser welatên cîran û gemiyên din ên bazirganî li Kendavê, rûbirûbûna di navbera Amerîkayê û Komara Îslamî de dijwartir û berfirehtir bû. Di vê gotara kurt de, ez dixwazim senaryoyên ku di rojên pêş de şerê berdewam pê re rû bi rû ne, binirxînim.

Senaryoyên jêrîn ji aliyê gelek komên cuda ve derbarê şerê berdewam de, ji aliyê gelek analîst, çi Îranî û çi ne-Îranî, û di gelek dezgehên medyayê de hatine pêşkêş kirin. Bi raya min, eger em bixwazin ji alîgirî û xapandinên li hember aliyeke taybetî di vê pevçûnê de azad bin, û ne tenê ji ber dijberiya demdirêj an nû ya li hember Rejîma Îranê, her analîzek bêyî berçavgirtina wêneyê an projeya berfirehtir dê şaş bibe.

Ez li ser vê baweriyê me ku projeya "Rojhilata Navîn a Nû" pêdiviya demê ye û ji bo berdewamiya jiyaneke çêtir li cîhanê pêwîst e. Ev proje, ku bi rastî li ser milên polîtîkayan hatiye avakirin, hem piralî ye û hem jî cîhanî ye. Rojhilata Navîn, weke dilê lêdana cîhanê û ciheke ji bo avakirina aştiya cîhanî, xwedî hesasiyeteke mezin e. Bila em ji bîr nekin ku dabeşbûna jeopolîtîk a sed û pêncî salên borî, ku bi şêweyê Hartland û Rimland ê bûye û berdewam dike, li ciheke bi navê Rojhilata Navîn digihîje kupika girîngiya xwe.

Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê ya berê û hilweşandina Peymana Warşo yê, aliyê lîberal-kapîtalîst a cîhanê, bi pêşengiya Amerîkayê, sal bi sal bi pratîkî nêzîkî sînorên Rûsyaya îroyîn bûye.

Bo mînak, nêzîkbûna Ukraynayê ji Rojava re, daxwaza wê ya endametiyê di Yekîtiya Ewropayê de û tevlîbûna di Rêxistina Peymana Atlantîka Bakur naskirî bi (NATO) de, ku Serkomarê Rûsyayê Putîn ber bi şereke dirêj ve bir, û piştre hilweşîna Beşar Esed û hilweşandina Hikûmeta DAIŞê di vê herêmê de, û karesata 7ê Octoberê, û êrîşa Îsraîlê li ser Hemas û Hizbullahê, û parastina Komara Îslamî ji komên bedel û piştgiriya wê li herêmê û êrîşên li ser welatên ku hevalbendên Amerîkayê ne, şer gihandiye astek herêmî ya tam.

Niha ku ji aliyekê ve ev şer bûye herêmî û welatên cûrbicûr tê de beşdar bûne, û ji aliyê din ve Komara Îslamî niyeta lihevkirinê bi aliyê dijber re tune ye, pirsa di hişê welatiyan de derbarê pêşeroja vî şerî de bêtir derdikeve pêş: **dê çi bibe?**

Ez li ser vê baweriyê me ku pêşeroja vî şerî divê di çarçoveya projeya Rojhilata Navîn a Nû de ku min li jor behs kir, were lêkolînkirin. Ji ber vê sedemê (herêmî-cîhanî) û ji ber sedemên têkildarî rejîma Îranê û krîzên dijwar ên (navxweyî) yên ku ew pê re rû bi rû maye, îhtîmala ku rejîma heyî ya ku Îranê birêve dibe li ser desthilatdariyê bimîne ne mumkin xuya dike.

Yanî derbasbûn yan nemana Komara Îslamî ne tenê ji bo gelên Îranê, ji bo herêmê û cîhanê jî weke DAIŞ'ê bûye pêwîstiyek. Lê ev veguhertina ku bi rastî projeyek e û dê di piroseya demê de pêk were, çawa û kengê wê were cîbicîkirin, hewce ye ku behsa du xalan were kirin.

Pêşî, pêkanîna projeya derbasbûn ji Komara Îslamî bi salan e ku di rê de ye, û şerê heyî beşek an jî yek ji qonaxên pêkanîna projeya bidawîanîna berdewamiya Komara Îslamî ye. Bi rastî, pêvajoya derbasbûn ji Komara Îslamî berê xwe daye destpêkirin.

**Ya duyemîn, em ê kengî hilweşîna rejîma Îranê bibînin?** Li gorî nivîskarê vê gotarê, bersiva vê pirsê wiha ye: Heta ku alternatîfek an cîgirek pêbawer di nav dijberên Komara Îslamî (opozîsyon) de dernekeve holê, faktora demê dê roleke micidtir di kalîte û asta projeya derbasbûn de bilîze. Ev jî vedigere girîngiya welateke bi navê Îran.

**Îran welateke mezin e ku li dilê Rojhilata Navîn e.Di 48 salên borî de, Komara Îslamî piştî şoreşa 1357an a Rojî zêdetirî çar dehsalan ji Rojava ber bi Rojhilat ve çûye. Bi gotineke din, rejîma ku Îranê birêve dibe di çend dehsalên borî de welat veguherandiye bindestê Çîn û Rûsyayê, û di vê demê de, van her du welatan di warê aborî, bazirganî û ewlehiyê de veberhênanên mezin li Îranê kirine.**

Ji ber vê yekê cure û awayê danûstandinê bi Komara Îslamî re bi cureyê têkiliyê û belkî jî rûbirûbûnê di asta berjewendiyên van her du welatên sereke yên ku piştgiriyê didin Komara Îslamî ve girêdayî ye.

Lê di dawiyê de, pêwîst e behsa rola Donald Trump serkomarê Amerîkayê û pêwendiya aborî ya wî ligel Çîn û şerê Rûsiyê yê di gel Ukraynayê bê kirin û ku Amerîka bi serperiştiya Trump heta radeyekê kariye bandorê li proseya derbasbûna ji Komara Îslamî bike.

Lê di her rewşê de û di her serdemekê de, bi raya min, ji bo pêşîgirtina li rawestandina pêvajoya derbasbûna ji rejîma desthilatdar li Îranê, şerê navxweyî û bûyerên nexweş, lihevkirinek li ser platformek hevpar a têkoşînê li dijî Komara Îslamî û parastina ewlehî û azadiya welatiyan di piştî Komara Îslamî (serdema veguhêz) de di navbera opozisyonê de dikare bibe faktorek din a bi bandor di pêvajoya têkoşîn û rûbirûbûna bi rejîma Xumeynî re û rizgarkirina Îranî û Îranê ji lepên rejîma sûcdar de.

Bi dîtina min, hebûna berdewam a Komara Îslamî ne tenê ji bo Îran û Îraniyan, lê di heman demê de ji bo herêm û cîhanê jî weke metirsî û faktorek zirardar tê hesibandin, û têkoşîna ji bo hilweşandina Komara Îslamî erk û pêwîstiyek exlaqî û mirovî ye.

# Ji Nû ve Pênasekirina Têkoşîna Kurdî di Serdema guherînên Mezin de



N. Dr. Mehmûd Ebas



**Beşa Çarem**

**Neteweyên Biçûk û Cihê Wan di Pergala Nû ya Cîhanê de**

Di pergala nû ya cîhanê de, giraniya netewe û welatan êdî tenê bi firehiya erdnîgariyê, hejmara gel an mezinahiya hêza leşkerî nayê pîvan. Ceribandinên çend dehsalên dawî nîşan didin ku welatên biçûk dikarin bi rêxistina baş, veberhênana li mirov, avakirina aboriyeke hilberîner û çalakiyeke derveyî ya jîrane, giraniyeke ji pîvana xwe ya erdnîgarî mezintir bi dest bixin.

Sîngapûr tengiya erdnîgariya xwe bi perwerde, rêkûpêkî, rêveberî û şiyana aborî veguherand hêzê. Estonya bi zanîn, teknolojiyên dîjîtal û rêveberiya nûjen cihê xwe ava kir. Qeter jî, tevî biçûkbûna xwe, bandoreke ramyarî, ragihandinî û darayî ya berfireh bi dest xist. Ev nimûne nayên wê wateyê ku cîhan bûye dadmend, belkî nîşan didin ku deriyên wê bi tevahî li ber neteweyên biçûk nehatine girtin, ger ew bizanibin hêzên xwe çawa rêxistin û bi kar bînin.

Gelê Kurd ne ji nav welatekî ku xwediyê saman û biryara xwe ye tev digere, belkî ji nav girtîgeheke mezin a erdnîgarî, ramyarî û aborî têdikoşe. Ji ber vê yekê, nikare mîna neteweyên azad pêşketineke temam ava bike. Pirsa rast ew e: **Kurd çawa dikare di nav van bendan de xîmê hêza xwe ava bike, da ku rê li ber şikandina wan veke?**

Felaket tenê di mezinahiya dorpêçê de nine, felaketa mezintir ew e ku dorpêç bibe hincet ji bo paşxistina her gaveke avakirinê, an bibe rewşek ku tê de têkçûn were birêvebirin, li şûna ku ji bo azadbûnê plansazî were kirin.

Li vir pirsa Kurdistanî bi tundî derdikeve pêş: **Ger netewe û welatên biçûk karîne di pergala cîhanî de ji xwe re cihekî bandordar ava bikin, çi tişt rê li ber gelê Kurd digire ku ji aliyê dîrokî, mirovî û erdnîgarî ve neteweyeke mezin e da ku bibe hêzeke çalaktir û bandordartir?**

Çima Kurd, tevî kûrahiya doza xwe, rastiya daxwazên xwe û hêzên mirovî yên ku xwedî ye, hê jî bi piranî di qada bindestiyê de maye, li şûna ku derbasî çalakiya rêkûpêk û avakirina cihê xwe bibe?

Pirsgirêk tenê nebûna welatekî serbixwe nine, herçend ev birîna herî mezin e, belkî bi awayê ku beşek ji hişmendiya ramyarî ya Kurdî li xwe û cîhanê dinêre jî girêdayî ye. Ev hişmendî hê jî zêdetir bi parastina xwe ji metirsiya rojane re mijûl dibe, ku çawa hebûna Kurdî veguherîne avahiyekê ku gav bi gav bihêz bibe.

Di cîhana îro de têrê nake ku doza te rast be, divê tu wê rastiyê veguherînî karekî rêkûpêk, hilberîner, bandordar û hêja.

Gelê Kurd ji hêmanên hêzê bêpar nine. Ew xwediyê hêzeke mirovî ya berfireh e, di gelek parçeyên Kurdistanê de civakeke ciwan heye, û li Ewropa û Amerîkayê xwediyê civakên koçber ên karîger e. Kurdistan herwisa xwediyê samanên xwezayî yên girîng, cihê erdnîgarî yê hestyar, ceribandineke ramyarî ya komkirî û bîranîneke têkoşînê ya bêmînak e.

Lê van remzên xwe hê jî neguhertine hêzeke yekgirtî û dûrnişîn, ji ber ku beşeke mezin ji wan belav e, di destê nakokiyên partiyan de maye, an li gorî bûyerên rojane tê bi kar anîn, ne li gorî dîtineke dûr û armanceke neteweyî.

Di nav hemû parçeyên Kurdistanê de, Başûrê Kurdistanê heta niha wek ceribandina herî pêşketî derdikeve pêş. Tevî kêmasî, asteng û dabeşbûnên xwe, kariye avahiyeke federal a naskirî ava bike, cihê xwe di hevkêşeya Iraqê de bipejirîne, û asteke avahîsazî, aramî û peywendiyên derveyî pêş bixe ku wê dike ceribandina herî gihîştî di dîroka ramyarî ya nûjen a Kurdî de.

Ev ne tenê serkeftineke rêveberî ye, belkî nîşan dide ku dema derfeteke ramyarî û kêmtirîn asta aramiyê ji Kurdan re were dabînkirin, ew dikarin avahiyeke serkeftî ava bikin, ku ji gelek dezmraweyên herêmê yên ji wê mezintir pêşketîtir be.

Lê nirxa rastîn a Başûrê Kurdistanê divê ne tenê li gorî tiştên ku di hundirê xwe de bi dest xistine were pîvan, belkî li gorî karê ku dikare ji bo tevahiya Kurdistanê bike jî were nirxandin. Ew dikare wek serkeftineke herêmî ya sînorkirî bimîne, an jî bibe navenda giraniya Kurdî û bingehek ku bandoreke firehtir li ser hişmendî, ramyarî, aborî û peywendiyên navneteweyî biafirîne.

**Pirsa bingehîn li vir ew e: Başûrê Kurdistanê çawa dikare ji avahiyekê ku tenê xwe diparêze, veguhere bingehekê ku giraniya tevahiya Kurdistanê bilind bike?**

Li parçeyên din ên Kurdistanê, rewş aloztir e. Li Rojavayê Kurdistanê, ked û xwîna rijandî heta niha nekarîne danasîneke ramyarî û neteweyî ya bi hêz, li gorî asta fedakariyan, ava bikin. Li Rojhilatê Kurdistanê, zordariya Îranê rê li ber pêkhatina qadeke ramyarî ya xwezayî digire. Li Bakurê Kurdistanê jî giraniya gelî û têkoşîna Kurdî di nav bendên desthilatdariya Tirkiyeyê û nakokiyên wê de hatiye dorpêçkirin.

Bi vî awayî, doza Kurdî, tevî hebûna xwe ya bihêz, hê jî nekariye vê hebûnê veguherîne avahiyeke yekgirtî ya bandorê.

Ji ber vê yekê, nîqaşa Kurdî divê êdî dîle pirsa «Em çawa tiştên heyî biparêzin؟» nemîne. Divê derbasî pirseke pêşketîtir bibe: **Em çawa cih û giraniya xwe ava bikin?**

**Em çawa şiyanên Kurdên li derveyî welat, hêza ciwanan, samanên xwezayî û cihê erdnîgarî veguherînin perwerdehiyeke çêtir, aboriyeke hilberîner, saziyên kokdar û torên bandora navneteweyî? Em çawa ji bersivdana neteweyî derbasî çalakiya neteweyî ya hilberîner bibin?**

Neteweyên biçûk ên ku cihê xwe li cîhanê ava kirine, li benda naskirineke belaş a cîhanê neman, belkî wan bi destê xwe şertên rêzgirtin û naskirina xwe ava kirin. Ev ders divê bikeve navenda hişmendiya Kurdî.

Doza Kurdî tenê bi rastiya bindestbûna xwe pêş nekeve, belkî bi şiyana Kurdan a veguherandina vê bindestiyê bo karekî avakirinê pêş dikeve. Kurd tenê ji ber ku rastî zordariyê hatiye, di pergala nû ya cîhanê de nabe hêzeke çalak, belkî dema ku nîşan bide dikare samanên xwe rêxistin bike, saziyên xwe ava bike û bi hişmendiyeke dîrokî ya nû cihê xwe bi dest bixe.

Cudahiya di navbera neteweyekê ku li peravê cîhanê dimîne û neteweyekê ku cihê xwe tê de ava dike, tenê mezinahiya birînê çênake, belkî asta hişmendiyê çêdike ku dikare birînê veguherîne bo hêz û armancekê.

**Li vir pirsa rastîn a li pêşiya tevgera Kurdistanî ya îro derdikeve pêş: Gelo ew dixwaze tenê parêzvanê bîranîna bindestiyê bimîne, an dixwaze derbasî qonaxa avakirina cih û giraniya xwe bibe?**

Pergala nû ya cîhanê, tevî tundî û bêrehmiya xwe, rê ji bo wan netewan vedike ku dizanin xwe çawa rêxistin bikin, hêzên xwe çawa bi kar bînin û doza xwe çawa ji qîrîna nerazîbûnê wêdetir bibin.

Ger Kurd di vê veguherînê de serkeftî bibin, êdî tenê neteweyek nabin ku mafê xwe dixwaze, belkî dibin neteweyek ku di pergala cîhanî ya ji nû ve tê avakirin de dest bi danîna giraniya xwe dike.

**Dê bidome…**

## Nerîna Lîderan




“Xalid Ezîzî”:

**“Komara Îslamî hewl dide bi afirandina krîzan demê bi dest bixe.”**



“Donald Trump”:

**“An peyman ,an jî êrîşeke leşkerî ya kujer.**



“pete hegseth”:

**“Wezîrê şer ê Amerîka dibêje: em li bilindtirîn asta amadebaşiyê de ne.”**



“Volker Turk”:

**“Bila darvekirin li Îranê bi dawî bibin.”**

# Gelawêj e û dîsa bêhna Kurdan ji bo serxwebûnê fireh dibe



N. Eskender Ceiferî




Heyva Gelawêjê di nav hemû heyvên salê de ji bo Kurdan wateyeke taybet bi xwe re tîne. Gelawêj, tê wateya hewldan ji bo rizgarbûn ji tepisandinê.
25’ê Gelawêja îsal 81’emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistanê ye, PDKÎ sala 1945’an li ser bingeha rêxistina Komeleya Jiyaneweya Kurd, (J.K) ku sê salan berî wê pêk hatibû, hate avakirin.

Niha jî rabûn, bi hemû werz û dansalên xwe, rengê nîştimana Gelawêjê dide welatê me.

Beriya çend salan dema ku Hizba Dêmokrat basa xebatê dikir, digot em niha di warê rêkxistinî û siyasî de xebatên xwe dimeşînin. Lê vê carê rewş cuda ye û ev çend sal in ew partî baseke cuda dike. Ew dibêje dibe ku rewş were guhertin.Beriya çend salan, piştî Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, hin partiyên din ên Kurdistana Rojhilat jî hêzên xwe birin sînor.

PDKÎ ku mîratgira Komara Kurdistanê ye, hertim li pişta xelkê xwe bûye. Xelk jî dibêje ku eger şerê demjimêra sifr a jinavbirina rêjîmê çê bibe, ew amade ne.

Ji aliyekî din ve vê partiyê jî çendîn şehîd di pevçûnên xwe bi Spaha Pasdaran re dane û gelek ziyan li Spahê dane. Ev çalakî, heman xebat in ku ji Gelawêja 81 salan berî niha ve dest pê kirine û hîn didomin.Gelawêj tenê ji bo Kurdan nayê wateya xebatê. Gelê Urogoyê yek ji wan gelan e ku di vê heyvê de serxwebûn ji xwe re bi dest xistiye.

Ew sala 1825’an ji Birêzîlê cuda bûn. Neteweyeke din ku di vê heyvê de çarenivîsa xwe diyar kir, Bêlaros e ku sala 1991’an ji Yekîtiya Sovyetê veqetiya û serxwebûna xwe ragihand.
Dilê Kurdan jî bi Gelawêjê xweş e û ew ji bo ku bigihin Gelawêjeke azad, xebata xwe didomînin.

Ne PDKÎ û ne jî partiyên din ên Rojhilatê Kurdistanê, li bendê nîn in ku aliyên derve û welatên din, Kurdistanê ji bo wan rizgar bikin. Lê ew dizanin ku Donald Tiramp serokkomarê Amêrîkayê di kiryarên xwe de li hemberî Îranê xurt e. Li gor wan, Tiramp weke Obama ji Îsraîl û Seûdiyê naxwaze li hemberî Îranê nerm be lê belê dê lidij derkeve.

Hemû partiyên netewegir ên Rojhilat û di nav de jî Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê dibêjin Kurd neteweyek e û Kurdistan jî welatek e û divê partiyên Kurdî li ser bingeha berjewendiya netewî tevbigerin.

**Gelawêj, Pûşpera xembar a Dr. Qasimlû jî bîr nake, Xakelêwa Qazî û Xermanana Şerefkendî jî ti caran ji bîr nake û lewma jî keç û xortên Kurd ref bi ref tevlî rêza xebatê dike û li hemberî desthilata tepisandibê û gemar a rêjîma dagirkar a Îranê perwerde dike.**

Êdî ji bilî pêşmergeyan navbajar, endamên eşkere ên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li Herêma Kurdistanê jî, ji bo berxwedana çekdarî li hemberî rêjîma meleyên Tehranê têne rahênan. PDKÎ ku mîratgira Qazî Mihemed, Dr. Şerefkendî û Dr. Qasimlo ye, sala 2017’an ji bo cara yekemîn navê Pêşmergeyên Navbajêr bi kar anî.

Ew jî, ji bilî wan hêzan e ku weke Bazên Zagrosê dihatin binavkirin û bi taktîkên xwe û bi riftar û kiryarên xwe dişibin vê partiyê û xelk jî, wan, ji vê partiyê cuda nabîne. Tevî ku PDKÎ berpirsyaretiya kiryarên wan nedaye ser xwe, lê rabûn û serhildan, bi hemû demsalên xwe, Pêşmergeyên Navbajêr, Pêşmergeyên Çiya, Bazên Zagrosê û... hemû di xizmeta Gelawêja 81 salan xebat û berxwedanê de ne û di pêxema pêşerojeke geş de ne.

Ne sêdareya Çarçirayê, ne têrora Viyenê, ne têrora Mîkonosê û ne jî şehîdkirina bi hezaran keç û xortên Kurd, nekarî bejna neteweya me li hemberî dagirkar bitewîne. Lê belê xebata wan ji berê germtir û xurttir bûye û bi tîrêjên welatê agir û rojê, sibeh û şevê, dilê ciwanan ji bo evîna welat dinexşîne.

Kevnartirîn partiya Kurdî ku bi awayekî rêkxistinî, di qonaxên cuda de ji serdema Komara Kurdistanê ve li ser piyan sekinî, bi xebata veşartî di serdema Pehlewiyan de û bi xebata eşkere ya ku bi destê Dr. Qasimlû dest pê kir, nîşan da ku modêrnîzebûn, tenê ev nîn e ku berên xwe bidin welatên rojava û her tişta ku ew bikin, em jî bikin.

Bê guman PDKÎ nîşan daye ku dilê Gelawêj û Gelawêjdostan nahêle û bi dahênanên nû, dê ji bo dabînkirina mafên netewî û dêmokratîk û modêrn ên Kurdan, di kar û xebata xwe de berdewam be.

# Di hejmara vê carê a Rojnameya Agirî de me liderheq 25ê Gelawêjê salvegera avakirina PDKÎ, digel rêzdar Dara Natiq Çalakê Siyasî hevpeyvîn encam daye.





**Hevpeyvîn: Dara Natiq**
**Hevpeyvînkar: Hesen Mukerem**

**Dara Natiq: Hizba Dêmokrat bawer e ku hêza rastîn ya berxwedanê ne tenê di çalakiyên siyasî de ye, lê di hişmendiya neteweyî, parastina nasnameya Kurdî, pêşxistina demokratî û girêdana gel bi armancên xwe de jî xuya dibe.**

**1- Hizba Dêmokrat a Kurdistanê di 25'ê Gelawêja 1945'an de bi çi armanc û hêviyan hate avakirin, û ew armanc heta niha çawa hatine parastin?**

Hizba dayîk û Hizba pêşewayê mezin yê Kurd Qazî Mihemed ankû Hizba Demokrat a Kurdistanê di 25'ê Gelawêja sala 1945'an de di rewiş û zirûfek pir hestiyar û hesas a siyasî û dijwar de hate avakirin bi merema parastina hebûna neteweyî ya gelê Kurd, bidestxistina mafên neteweyî û dêmokratîk, damezrandina rêveberiya dêmokratîk li Kurdistanê û pêşxistina azadî, dadperwerî û yekbûna gelê Kurd di çarçoveya Îranek dêmokratîk de ku mafên tev neteweyên di çarçoveya cugrafiya Îranê û yek ji wan jî mafên sereke yên gelê Kurd bihên parastin û dabîn kirin. PDKÎ ji destpêkê ve bawer bû ku pirsgirêka Kurdistanê bi rêya têkoşîna siyasî, xebata rêxistinî, piştgirîya gel û parastina mafên mirovan dikare çareser bibe.

Di dirêjahiya dîrokê de, Hizba Dêmokrat, tevî zext, serhildan, teror û şehîd kirina rêberên xwe yên karîzmatîk û bi sedan kadir ê pêşmerge û endam û layengirên xwe bi destê rejîmên mirov kuj ên Paşayetî û komara îslamî û herwisan hewraz û nişîvên xebatê pir dîtin û di şert û mercên pir dijwar de jî derbas bûn lê tu carî ji armanc û prensîbên xwe yên di pêxema parastin û bi destxistin û dabînkirina mafên gelê kurd paşde neketiye û xebat û tekoşîna xwe bi piştgiriya xelkê Kurdistanê bi girseyî berdewam kirye, û heta îro jî ev Hizba berdewam e. Ev domdarî nîşana wê ye ku armancên ku di sala 1945'an de hatin danîn, hîn jî bingehê têkoşîna Hizba Dêmokrat in û bi piştgiriya gelê Kurd têne parastin û pêşvebirin û xebat û tekoşîn jî herwa bi girseyî û bi moralek bilind a şorşgêrî berdewam e.

**2- Piştî 81 salan tekoşîn û berxwedanê, tu çi wekî girîngtirîn destkeftî û serkeftina Hizba Dêmokrat ji bo gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê dibînî?**

Di berdewamiya xebat û tekoşînê û herwisan hewraz û nişîvên di ser rêya xebatê û Piştî 81 salan tekoşîn û berxwedana bi serbilindî û lê pir dijwar de, girîngtirîn destkeftî û serkeftina Hizba Dêmokrat ew e ku kariye hebûna siyasî û nasnameya neteweyî ya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê biparêze û hestê azadîxwazî, yekbûn û berxwedanê ji nifşekî bo nifşekî din veguhezîne û herwisan tev wan pîlanên qirêj û hovane yên rejîma paşayetî û a xumeynî ji bo asimîle kirin û tune kirina gelê kurd pûç bike û morala şorişgêrî û xebatê di nava xelkê kurdiatanê de bilind bike û bibe cihê hêvî û bawera neteweya Kurd. PDKÎ di tevahiya dîroka xwe de, tevî zindan, teror, şehîdbûn û zextên giran, ji armancên xwe yên dêmokratî, mafên neteweyî, mafên mirovan û çareseriya dêmokratîk a pirsgirêka Kurdistanê paşde neketiye û xebat û tekoşîn bi hemî rengên xwe yên pêşketî we berdewam e.

Herwisa, PDKÎ kariye pirsgirêka Kurdistanê wekî pirsgirêkek siyasî û neteweyî li astên cûda yên navxweyî û navneteweyî zindî bihêle û dengê maf û daxwazên gelê Kurd bigihîne cîhanê. Di heman demê de, bi xebata rêxistinî, parastina nirxên dêmokratîk, pêşxistina rola jinan û ciwanan, û girêdana têkoşîna neteweyî bi mafên giştî yên mirovan, Hizba Dêmokrat bûye sembola berdewamî, hêvî û berxwedana gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê. Damezrandina yekemîn dewleta moderin a kurd bi navê komara kurdistanê, marşa neteweyî a ey reqîb û navê pêşmerge û hêza pêşmerge û ala kurdistanê û…. Ji wan destkewtên herî girîng a xebata zdetir ji 8 dehikan a vê Hizbê ne.

Ji bo gelek Kurdan, ev domdarî û sekinîna li ser pirensîb û armancan, bi xwe serkeftinek mezin e; ji ber ku nîşan dide ku, tevî hemû asteng û zordariyan û tevî berdewamiya mûşekbaran kirin û gef û erişên hovane yên rejîma îslamî a îranê lê, îradeya gelê Kurd ji bo bidestxistina azadî, dêmokrasî û mafên xwe hîn jî zindî û bihêz e.

**3- Hizba Dêmokrat di van 81 salan de gelek zordarî, girtin, şehîddan û êrişên rejîma Îranê dîtine. Ev berxwedan çawa karîye ruhê xebat û azadiyê di nav gelê Kurd de zindî bihêle?**

Di dirêjahiya zêdetir ji heşt dehikan ji xebat û tekoşîna berdewam a xwe de, Hizba Dêmokrat bi girtin, zindan, şehîdbûn, teror mûşekbaran û êrişên berdewam ên rejîma cinayetkar û hov a Îranê re rû bi rû bûye. Lê ev zordarî û gef û erişên han berdewam û hov tu car nekarîne îradeya xebat û tekoşîna mafxwazî a PDKÎ û gelê Kurd bişkînin. Berevajî wê, ev berxwedan bûye çavkaniyek ji bo bihêzkirina ruhê azadîxwazî, berxwedan û baweriya gel bi maf û doza xwe re û hêviya gelê me bi azadî û serkewtinê û berdewamiya xebatê bilind bûye.

PDKÎ hertim li ser wê baweriyê ye û bi hizir û nêrînên partiyê xwîna şehîdan, fedakarîya pêşmergeyan û xebata domdar a endaman û alîgirên Hizbê bûye mîratek neteweyî ku hestê berpirsiyarî, yekbûn û têkoşîna dêmokratîk di nav nifşên cur bi cur ên civaka kurdistanê de zindî hiştiye. Her êriş û zordariyek, li şûna ku dengê gelê Kurd bêdeng bike, bûye sedem ku daxwazên maf, azadî û dadweriyê bihêztir bibin.

Hizba Dêmokrat bawer e ku hêza rastîn ya berxwedanê ne tenê di çalakiyên siyasî de ye, belkî di hişmendiya neteweyî, parastina nasnameya Kurdî de, xuya dibe. Ji ber vê yekê, ruhê xebat û azadîxwaziyê di nav gelê Kurd de heta îro zindî maye û wekî hêzek ji bo bidestxistina mafên neteweyî, dêmokrasî û çareseriya aştiyane ya pirsa Kurdistanê berdewam dike.

**4- Di şert û mercên niha de, erkê nifşa ciwan a Kurd çi ye, û rolê wan di domandina xebata neteweyî de çawa tê dîtin?**

Nifşên ciwan ên Kurd ku cihê hivya pêşeroja Kurdistanê ne, di rewşa niha de hewceye hişmendiya neteweyî, rêxistinbûn, yekbûn û têkoşîna demokratîk xwe biparêzin. Hizba Dêmokrat ciwanan wekî hêza sereke ya guherînê û garantiya domandina doza neteweyî dibîne û bawer e ku berpirsiyariya parastin û pêşxistina mafên gelê Kurd niha ji her demê zêdetir li ser milê wan e. Nifşa ciwan weke hêza daînemo û guherînên dêmokratîk û pêşengê xebata azadî û neteweyî rolek bi bandor di xebat û tekoşîna îroyîn de dilîzin û cihê hêviya gelê kurd in.

PDKÎ li ser wê baweriyê ye ku ciwan divê bi hestekî bilind ê berpirsiyarî, bi zanist, çand, siyaset û xebata civakî xwe amade bikin û di hemû qadên jiyanê de ji bo parastina nasnameya Kurdî, mafên mirovan û dadweriyê rolek çalak bistînin. Herwisan, xebata neteweyî tenê bi fedakarî, rêxistinbûn, yekbûna nîştimanî û baweriya bi rêya têkoşîna demokratîk dikare bigihîje armancên xwe.

Lewra ez bang li ciwanan dikim ku mîrata têkoşîna zêdetir ji heşt dehikan a di encama xebat û tekoşîna berdewam a PDKÎ û bi piştgîriya xelkê mafxwaz yê Kurdistanê biparêzin, ji bîr û armancên pîroz yên şehîdan û fedakariyên pêşengan hêz û moralê bistînin û bi hişmendî, hêvî û îradeyek bihêz, xebata neteweyî û demokratîk berdewam bikin. Bêguman amadebûna nifşên ciwan, doza maf û azadiya gelê Kurd dê bi hêztir berdewam bike û pêşerojek geş ji bo Kurdistanê bê avakirin.

**Gelek spas bo rêzdar Dara Natiq**

# Kolberî, Berdewamiya Fetwa û fermana 1358an û Jiyana di bin dagirkeriyê de



N. Hemîd Çepatî



Li Kurdistanê, Bûyer û karesata Kolberiyê ne tenê pirsgirêka nan û an jî karê neyasayî ye. Kêmkirina vê malwêraniyê bo pirsgirêke aborî ya sade, veşartina rastiyeke tal e ku di koka siyasî û ewlekarî ya li Kurdistanê de rolek girîng lîstiye. Kolberî berdewamî û forma îro ya wê şer û fetwa û fermanê ye ku di tebaxa sala 1979an (1358) de li dijî gelê Kurd hate derxistin, fermaneke ku can, mal, xak û nasnameya Kurdistanê kir armanc û ji wê demê heta îro, di şêweyekî nû de bi guleyên rasterast li ser kolberan û tunekirina bingehên jiyanê dewam dike.


Ji bo tişta ku îro li Kurdistanê çêdibe û xortê ku di bin barên giran de dişkên were fêmkirin, divê em vegerin tebaxa 1979an. Wê demê bi fermana rêberê wê demê ê rêjîma Îranê, fermana êrişeke mezin li ser Kurdistanê hate dan. Bi vê fermanê, Spaha Pasdaran wekî milê leşkerî yê hikûmeta nû ket nav Kurdistanê û ev herêm wekî cihê azmûm û taqîkirina serkutkirine û kuştinê hat destnûçan kirin.

Kurdistan buye pelîkan bo bilindbûna pileyên leşkerî yên fermandaran ku xelat û nîşanên xwe li ser axa bi xwîn a Kurdistanê bi dest xistin. Encamên wê êrişa yekem, serdestiya ewlekarî ya li seranserî Kurdistanê bû. Ji wê demê û vir de, bajar, gund û çiyayên Kurdistanê wekî leşkergehekî mezin lê hatin.

Îro li Kurdistanê, hejmara bingeh, bircên çavdêriyê û xalên kontrolê ji tabloyên ser rê û avadaniya bajar gelekî zêdetir e. Pûtînên leşkerî ne tenê rê, lê belê qirrik û sifreya xelkê jî zext kirin da ku hemû beşên jiyanê di bin kontrola tam de bin.

Ev nêrîna ewlekarî, buye sedem ku bi zanebûn rê li ber her cûre pêşveçûn û avakirina karxaneyan bê girtin. Di van hemû salan de bi hincetên pûç ên nebûna ewlehiyê, destûr nedan ku karxane û cihên kar bêne çêkirin da ku ji bo ciwanan kar bê çêkirin. Ev feqîr-hiştin, ne bûyerek sade ye, belkî siyaseteke plankirî ye da ku xelk feqîr û hewcedar bimînin. Dema ku hemû rêyên kar û debara jiyanê tên girtin, gelê Kurd mecbur dimîne ku di navbera birsîbûnê an jî çûna çiyayên dijwar bo hilgirtina barên giran de, yekê hilbijêre.

**Sînor di hemû cîhanê de cihê bazirganî û aramiya xelkê ne, lê li Kurdistanê sînor bûye qada şerekî yekalî û wêranker. Ciwan, xwendekarên zanîngehê, bavên kal û zarok jî ji bo pariyek nanê kêm neçar in barên giran bi kîlometreyan di rêyên dijwar û berfîn de li ser pişta xwe bipêçin.**



Ew di vê rêyê de bi xetereya mînan, ketina ji zinaran, cemidîna di sermayê de û ya herî girîng gulebarana leşkeran re rû bi rû ne. Kolber tevî ku dizane çi xeter li benda wî ne dîsa jî diçe, ji ber ku rêyeke din ji bo tijîkirina zikê malbata xwe tune ye.

Nakokiya herî mezin ev e ku hêz û saziyên hikûmetê, bi xwe sînor kirine rêyek ji bo qezencên milyardî û qaçaxçiya mezin, lê ji kolberê belengaz re ku ji bo xercca xwe ya rojane çend kîlo bar hildigire, navê qaçaxçî lê dixin û wî gulebaran dikin.

Navkirina kolber wekî qaçaxçî, rêyek e ji bo rewa nîşandana kuştina wî. Di van rojên dawî de jî bi dehan ciwanên kolber li sînoran bêyî hişyarî hatin gulebarankirin û canê xwe ji dest dan an jî kêmendam bûn. Guleberdana li kolberan ne bûyereke tesadufî û bêsedem e, belkî encama nêrînekê ye ku canê gelê Kurd bênirx dibîne.

Tişta ku îro li sînoran çêdibe, ji dîroka serkutkirina Kurdistanê ne cuda ye. Belaya kolberiyê berdewamiya rasterast a wê fermana sala 1979an e, fermanek ku rojekê bi top û tankan bajar dixistin bin agir û îro bi çêkirina bêkariyê û guleyên rasterast li sînoran canê ciwanan distîne. Ev ferman îro di sifreyên vala, bêkarî, bêparbûn û cenazeyên ku her roj li ser milên xelkê tên rakirin de dewam dike.

Kolberî belayeke bi zorê û zilmeke mezin e. Ev rewş tenê wê demê diqede û dê xilas be ku nêrîna ewlekarî û leşkerî ji ser Kurdistanê bê rakirin û mafê jiyanê û edalet ji bo gelê Kurd bê destxistin. Heta ku Kurdistan di bin dagirkeriyê de be, ji bo wan ti ferq nake, kolber be, pêşmerge be, xwepêşander û çalakkvanê siyasî be an jî xeklê adî bin, tenê Kurd be bes e da ku wî bidin ber guleyan.

Heta wê rojê, her dilopeke xwînê ku li ser zinarên van çiyayan dirije, belgeyek e li ser zulm û zordarîya wan kesên ku nanê xelkê bi xwînê tevlî kirine, û ax û ziman û jîyan ji wan sitandin e.

# Tiştên ku divê Kurdistan ji jenosîda sala 2014an li Şingalê fêr bibe



N. Sefiye Xalidî



Tebaxa 2014an bi kûrahî di bîra Kurdistanê de maye. Li Şingalê, rêxistina bi navê Dewleta Îslamî êrîşeke li dijî xelkê Êzidî da destpêkirin. Bi hezaran kes hatin kuştin, jin û zarok hatin revandin, malbat ji hev hatin qutkirin û bi sed hezaran kes neçar man ku birevin. Neteweyên Yekbûyî ew tawanên ku ji aliyê Dewleta Îslamî “Daiş” ê ve li dijî Êzidiyan hatine kirin, wekî jenosîd nas kirine.
Lê belê her sal, gava em Şingalê bi bîr tînin, divê em tenê li paş xwe nenêrin. Divê em li pêşiya xwe jî binêrin û pirseke dijwar bipirsin: Divê Kurdistan çi biguherîne da ku piştrast bike ku karesateke wiha careke din qet çênebe? Şingal ji bo Êzidiyan(herwisa ji bo miletê kurd) karesatek bû, lê di heman demê de ji bo tevahiya Kurdistanê jî hişyariyek bû.
Gelek Êzidî xwe wekî beşek ji gelê Kurd û dîroka Kurdistanê dibînin. Di heman demê de, xwediyê nasnameyeke olî û çandî ya cuda û kevnar in ku divê rêz jê re were girtin û were parastin. Di vî warî de berpirsiyariyeke taybet dikeve ser milê Kurdistanê: divê civakek tenê dema pêdiviya wê bi parastinê hebe wekî beşek ji Kurdistanê neyê dîtin, û piştre dema rewşa siyasî dijwar dibe, were jibîrkirin.

Di vê salvegerê de, pêdiviya Êzidiyan bi gotinên xweş nîne. Pêdiviya wan bi ewlekarî, nûnertiya siyasî, paşerojeke li welatê xwe û wê piştrastiyê heye ku gava careke din metirsî derkeve holê, ew ê careke din bi tenê neyên hiştin.
Êrîşa DAIŞê jenosîdek bû ku bingeha wê li ser sedemên olî bû.

Wê rêxistina tundrew Êzidî wekî kafir didîtin û hewl dida hebûna wan ji holê rake. Lêbelê, dîroka herêmê jî nîşan dide ku nakokiyên derdora Kurdistanê nayên şîrovekirin tenê bi pîvanên olî. Li Rojhilata Navîn, mijar herwisa ax, desthilatdarî, kontrola siyasî, nasnameya etnîkî û paşeroja nifûsa Kurd jî li xwe digirin.

Lewma, divê Kurdistan dijberên xwe yên siyasî û gefên ku pê re rûbirû ye, bi awayekî realîst analîz bike. Ne her nakokî olî ye; berjewendiyên siyasî û axê di bin gelek nakokiyan de hene. Her kesê ku dixwaze Kurdistanê biparêze, divê ne tenê bipirse ka îro dijmin kî ye. Divê ew bipirsin ka çi berjewendiyên siyasî di bin nakokiyekê de hene, kî jê sûdê werdigire û ji bo paşeroja Kurdistanê çi encam derdikevin holê.

Yek ji wan dersên herî tal ên Şingalê ew e ku, eger hêzên siyasî yên gelekî li dijî hev bixebitin, ew gel nikare xwediyê ewlehiyeke mayinde be. Pêdiviya Kurdistanê bi pirrengiya siyasî heye. Partî û nêrînên cuda beşeke civakeke demokratîk in. Lê divê sînorên wan hebin. Dema mijar dibe ewlehiya gel, parastina welêt û jiyana mirovan, divê siyasetkirina li ser bingeha berjewendiyên partiyan qet neyê pêşiya berpirsiyariya hevpar.

**Pêdiviya Kurdistanê bi yekrengiya siyasî nîne; pêdiviya Kurdistanê bi yekîtiya stratejîk heye. Divê partiyên Kurd bikaribin bi hev re tevbigerin, tevî cudahiyên xwe yên derbarê mijarên sereke yên neteweyî de. Divê ewlekarî, parastina kêmneteweyan, perwerde, pêşveçûna aborî û paşeroja siyasî ya Kurdistanê neyên girêdan bi berjewendiyên demkurt ên partiyan ve.**

Divê Kurdistana bihêz ne tenê ji bo piraniyê xurt be. Kurdistana bihêz ew e ku tê de Êzidî, Xiristiyan, Kakaî, Tirkmen, Ereb û civakên din bikaribin bi ewlehî bijîn. Bi rastî jî, awayê muamelekirina bi kêmneteweyan re ye ku diyar dike ka welatek bi rastî çiqas xurt û demokratîk e. Lewma, parastina Êzidiyan ne tenê pirsgirêkeke taybet a Êzidiyan e.

Ev berpirsiyariyeke Kurdî ye. Dema ku beşek ji gel rastî zilmê tê, ji cih û warê xwe tê derxistin an jî tê kuştin, tevahiya civakê jê bandor dibe. Lewma divê Şingal jî bibe xaleke werçerxanê. Divê Kurdistan sazî û pêkhateyên wiha ava bike ku rê li ber bêparastinmayîna gelê wê di kêliyeke krîtîk de bigirin. Tiştê ku pêwîst e, saziyên ewlehiyê yên pispor, berpirsiyariyên bi zelalî diyarkirî û stratejiyeke demdirêj a ji bo herêmên nakokî li ser hene, pêwîst in.

Ji bo gelek kesên ku ji komkujiyê rizgar bûne, Şingal hîn ne tiştekî berê ye. Gelek kes bi encamên qirkirinê re dijîn; malbat li benda hezkiriyên xwe ne, gelek jin û zarok hîn jî encamên dîlgirtina xwe dikişînin, û gelek kes nekarîne bi awayekî daîmî vegerin welatê xwe. Ji ber vê yekê, lidarxistina çalakiyek bîranînê salê carekê têrê nake.

Pêwîstî bi gavên pratîkî heye: Divê piştgirî ji bo vegera kesên jicîhûwarkirî were kirin. Şengal pêdivî bi ewlehî, binesazî, dibistan, xizmetguzariyên tenduristiyê û derfetên kar heye. Kesên ku ji komkujiyê rizgar bûne, pêdiviya wan bi piştgiriya demdirêj heye. Divê tawan bên belgekirin û berpirsiyar jî bên cezakirin. Ya herî girîng, divê xelkê Şengalê bi xwe di diyarkirina paşeroja xwe de xwedî gotin bin.

Dîroka Kurdistanê dîroka serhildan, zilm, koçberî û komkujiyan e. Tam ji ber vê yekê, divê Kurdistan ezmûna xwe ya siyasî ji bîr neke. Kesên ku dîroka xwe dizanin, fêm dikin ku ewlekarî ticarî tiştekî misoger û garantîkirî nîne. Lewma, divê gelê ku dixwaze paşeroja xwe ya siyasî diyar bike, dema karesatek rû dide, ne tenê bi awayekî hestyarî tevbigere; divê ji berê ve ji bo parastina gelê xwe saziyan ava bike. Bersiva herî baş a li hemberî Şingalê, Kurdistanek e ku amade, yekgirtî û ji hêla siyasî ve jî hişyar û zîrek be.
Kurdistanek ku fêm dike ku dabeşbûna navxweyî dikare qelsiya herî mezin a gelekî be.

DAIŞê bi rêya jenosîda xwe xwest ku tirs û bêhêvîtiyê belav bike. Armanca wê ew bû ku civakekê ji axa wê ya bav-kalî derxîne û nasnameya wê tune bike. Lewma divê berteka Kurdistanê ne tenê xemgînî be. Divê ew bertek li ser bingeha berpirsiyariya siyasî be.

Divê em qurbaniyan bi bîr bînin, lê di heman demê de ji çarenivîsa wan dersan werbigirin. Divê em piştgiriya rizgarbûyan bikin, lê herwisa pêkhateyan ava bikin da ku piştrast bin ku êdî kes bêparastin namîne. Divê em cudahiyên xwe yên siyasî nîqaş bikin, lê di mijara berjewendiyên bingehîn ên Kurdistanê de yekgirtî bin.

Divê em fêm bikin: Pêşeroja Kurdistanê dê ne tenê bi çekan were diyarkirin. Ew ê bi yekîtiya siyasî, perwerde, hêza aborî, saziyên demokratîk û dîtineke hevpar were avakirin.

Şingal divê qet neyê jibîrkirin, ne tenê ji ber ku li wir jenosîd li dijî Êzidiyan pêk hat, ji ber ku Şingal tîne bîra me ka çi dikare bibe dema ku gelek ji hêla siyasî ve parçebûyî, ji hêla leşkerî ve ne amade û di asta navneteweyî de ne têra xwe parastî be. Ji ber vê yekê, Tebaxa 2014 divê ji bo her nifşî wekî dersekê xizmet bike.

Çimkî êdî pirsa herî girîng ne ew e ku di Tebaxa 2014an de çi qewimî. Pirsa herî girîng ev e: Îro em çi bikin da ku piştrast bin ku zarok û neviyên me careke din neçar namînin ku tebaxeke mîna ya sala 2014an de bijîn?

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Komara Îslamî du kesên din bi tohmeta sîxuriya ji bo Îsraîlê bidar vekirin

Dezgeha Darazê ya Komara Îslamî di berbangê duşema 12ê Gelawêjê de nûçeya îdamkirina du girtiyên bi navê Omîd Behzad û Pourya Sifivet bi tohmeta "hevkariya îstîxbaratî" û "sîxurî" ji bo Îsraîlê di dema şerê 12 rojî û şerê dawî yê Amerîka û Îsraîlê yê li dijî Îranê de ragihand.

Ajansiya nûçeyan a Mîzan, a ser bi dezgeha binav dadweriya rejimê, di rapora xwe de îdîa kiriye ku van du kesan "cihên hikûmetî û agahiyên têkildarî navendên leşkerî, polîsî û ewlehiyê" ji Mûsadê re şandine.

Ev biryara sepandî bi ser Omîd Behzad û Pourya Safvat, ev biryar di Dîwana Bilind a rejimê de jî hat pejirandin. Di vê raporê de behsa dem û awayê girtina van du welatiyan, hûrgiliyên dosyaya wan nehatiye kirin.

Berî bidarvekirina wan, ti agahdarkirina giştî ya berbiçav li ser dema girtinê, pêvajoya darizandinê an rewşa Omîd Behzad û Pûriya Sifivet nehatibû belavkirin û rêxistinên mafên mirovan jî ti rapor li ser dosyaya wan belav nekiribûn.



## Rejîma Îranê, Arvîn Xeyrxwahan, xortê 20 salî darvekir

Maşîna îdamê ya Komara Îslamî careke din xortekî nerazî yê bi navê Arvîn Xeyrxwahan, temen 20 salî û xelkê bajarê Şahrûdê û yek ji binçavkiriyên xwepêşandanên meha Befranbara sala 1404an di sipêdeya îro, 10ê Gelawêja 1405an de, li girtîgeha Şahrûdê darvekir.

Dezgeha dadweriyê ya rejîmê navbirî bi tohmeta beşdarîkirin di xwepêşandanan de û bi tohmeta "beşdarbûna di êrîşkirine ser mizgeftekê de" bi cezaya darvekirinê mehkûm kir, herwisa ev cezaye di pêvajoyeke nedadperwerane û nezelal de hatibû sepandin û cîbicîkirin.

Komara Îslamî ku di kontrolkirina kirîzan de bê deselat maye, careke din bi dara îdamê şer li dijî welatiyên nerazî yên di nava Îran û Rojhilatê Kurdistanê de destpêkiriye û di heftiya derbasbûyî heta îro 4 ji binçavkiriyên xwepêşandanên meha Befranbarê darvekiriye.



## Rêjîma Îranê di 16 rojan de 58 kes bidarvekirine

Saziya Mafên Mirovan a Îranê di rapora xwe ya herî nû de ragihand ku di 16 rojên yekem ên meha Pûşperê de, herî kêm 58 girtî di girtîgehên cuda ên Komara Îslamî ya Îranê de hatine sêdaredan.

Li gorî agahiyên amarî, rêjeya cîbicîkirina cezayan bi navincî wek 3 heta 4 kes di rojêkê de hatine tomarkirin.

Di nav kesên hatine sêdaredan de 55 Mêr, 3 jin, 5 girtiyên siyasî, 3 welatiyên belûç û zarokek hene.

Di beşa girtiyên siyasî de, ceza li ser endamekî Rêxistina Mucahîdînê Xelq û çar girtiyên xwepêşandanên sala borî hatiye sepandin û cîbicîkirin.

Li gorî agahiyên di wê raporê de, Girtîgeha Qizilhesar a Kerecê bi 9 halet, Girtîgeha Navendî ya Tewrêzê bi 8 haletan û Girtîgeha Adilabad a Şîrazê bi 7 haletan, hejmara herî zêde ya cîbicîkirina cezayan tê de hatine tomarkirin.

Vê rêxistinê ew çend jî diyar kiriye ku di çar mehên yekem ên îsal de bi giştî 301 kes li Îranê de hatine sêdaredan.



# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (523)